LAWIKÊ FILLE

Receb Dildar

Qefle li jêra Gundê Çilkaniyê sekinî. Li ciyê sekinîn aveke tenik a zelal diherikî. Pêşiyê suwarî çûn ser avê, ter û tije av vexwarin, ser û çavên xwe şuştin, dawiyê hespên xwe avdan. piştî ku hespên xwe girêdan, ji bo herin ser avê desdûr dan qefleyê û çûn li siya dareke gûzê rûniştin.

Qefle ji hal de ketibû, ji birçîna bi zorê dimeşiyan, dest û rûyên wan li ber tava havînê qemirî bûn, solên di lingên wan de pertî bûn; xwîn, ji lingên hinekan bi ser axa germ de diherikî. Bi zorê xwe gîhandin avê, pirranî wek dewaran quruçî ser avê bûn, kezeba xwe hênik kirin.

Dayikan bi kulman av didan zarokên xwe, yên li ser xwe, av di avêtin ser çavên kal û pîrên xwe, ji bo xwe hênik bikin,destmalên ji tava havînê reng dabûn, şil dikirin û didan de-

stên nexweşên xwe.

Hefteyek e ew birêde bûn, ji jor de dihatin zozanî bûn, ji germê hez nedikirin û ketibûn bin bandora germa berriyê.

Sultan şêxmûza Mêrdînê derbas kiribûn û li ser avên Çilkaniyê bîhn vedidan. Eger sax bimana wê li Dêrika Çiyayê Mazî ew tevlî qefleyê mezin bikirana. Jê pê ve berrî bû, germ û germistan bû, ji ezman agir dibariya.

Gundiyên yekeyek ji malên xwe derketibûn û li ser bênderên ber malan li hev civiyabûn, dadûn dû axa û melleyên xwe ber bi qefleyê de dimeşiyan. Hatin li qefleya filleyan nêzikî kirin, libin siyên daran li ser tûtikan rûniştin û wek nêçîrvanên li benda seyda xwe bin çavên xwe kutan nava qefleyê û bi wî awayî li wan temaşe kirin.

Qefle pirranî ji kal û pîran, pîrek û zarokan pêk dihat, Xort û zilamên li ser xwe di nav wan de xuya nedikirin, yan reviyabûn yan jî hatibûn kuştin. Kesên di qefleyê de, bi korkanî li dû qedera xwe dimeşiyan, nizanibûn bi ku de diçûn û wê çi bihata serê wan. Çimkî hejmara qefleya wan her diçûn kêm dibû. Gelek kes ji wan hatibûn kuştin.

Piştî ku çav li gundî pyan ketin qûnên xwe hinek din kutan ser hev, bi tirs, bi çavên lava li wan nêrîn. Zarokan xwe bi hemêzên dayikên xwe ve Şidandin û deng ji xwe birîn. Tirs û xofa musulmanan ketibû zikê wan. Wek di nav lehîyek har û dîn de bin, her carê hinek bi ber diketin. pirr caran çend gav ji wan bi dûr dixistin û wek ku îbadeta xwe bi cî bînin bi dar û keviran li ber çavên ên din bi awayekî hovane dikuştin, qêmîşê gulleyên xwe nedikirin.

Axa pêşwazî li leşkeran kir û emir da gundiyekî ku ji bo wan pezekê serjê bike. Paşê di leşker li wirhîştin û axa û leşkerên din dihevre kişiyan gund û çûn mala axa. herdu leşkerên nubedar jî temîniya qefleyê li gundiyan kirin û li bin siya dara gûzê ketin xewê. Gundî her diçû hinek din nêzî qefleyê dibûn, tirsa dilê filleyan jî her diçû zedetir dibû.

Zêdan jî wek gundiyên din li dora qefleyê diçû û dihat, kumekî spî dabû serê xwe, ji şalwar û çefiya wî ya nû xuya bû ku halê wî ne xerabe, emrê wî li dora çil, çil û pêncî bû. Kurikekî heftheşt salî bala wî kişandibû zêdan zîq lê dinêrî. Xofa gundiyan ketibû ser lawik, wî jî bi tirs li wan dinêrî, bin çengê dayika xwe ji xwe re kiribû star û li kêleka wê rûniştibû. Zêdan nêzikî li dê û kurik kir û bi dengekî nerm û dilovan ji dê re got:

Ez dixwazim kurê te bibim ji xwe re bikim kur. Mal û mulkê min pirre, ezê baş lê binêrim, bila çavê te li paş nemîne û dilê te frîqet be.

Diya lawik çavê xe kutabû çavê zêdan tê de li hêviyan digeriya, dixwest rastiya gotinên wî bipîve, lê ji bo pîvanê mezinek tunebû. Dudilî bû, ji hêlekî ve dixwest pê bawer be û kurê wê xelas be, li hêla din jî mirin û axa sar hebû. Di bin bîreke kûr û tarî de bûn ji bo rizgarîyê şoqeke biçûk nexuya bû.

Bêçare bû. Lawik kurdî nizanibû, lê hîş kiribû, hinek din xwe bi dayika xwe ve zeliqandibû. Dayika bêçare zêde nefikirî bi destê lawê xwe girt û dirêjî Zêdan kir û bi zimanê xwe çend peyv ji lawê xwe re got:

Here kurê min Apê te merivekî başe wê te bibe mala xwe, netirse.

xatirxwestinan ji bîr kiribûn lê dîsa jî berî çûndina lawik herdu çavên wî ramûsa û destê xwe li pişta wî xist. Zêdan bi destê lawik girt û hêdî hêdî ber bi gund ve meşiyan. Piştî ku ji qefleyê bi dûr ketin û dê fam kir ku wê kurê xwe nebîne hêsir ji çavan wek baranê hatin xwarê.

Carina hêvî dikir û şaş dibû, carina jî kevir lê dibariyan û star tune bû ku pê de bireviya. Ji bo tiştek neyê serê kurê wê ji Îsa û dayika wî ya Meyrem re bi dizî û bêdeng duayan dixwend û çavên xwe ji rêya ku kurê wê tê de wenda bûbû nedida alî.

Pişt re teqeta wê şikiya û serê wê ket ber wê. Duayên ku nedigîhiştin ser lêvan û nedibûn deng dubare dikir û dadiqurtandin. Lawê wê wek çivîke ku li ser şaxa darê cî diguhere û bi kêf û henek dileyize li ber çavên wê diçû û dihat.

Dilê wê germ bû, çû zarokatiya xwe, gîhşt dê û bavê xwe, xwişk û birayên xwe, mala lê mezin bûbû, darên fêkiyan û hemêzkirina dawîn ya delalîkê dilê wê kî dizane aniha li ku ye, qene sax bûna, xwezî wê çaxê min jî tifingek bigirta û

pê re biçûma paşê zarokên wê yek bi yek di nav dil û çav de çûn û hatin Her yek bûn kindirek û ketin stûyê min, hema vîya bifilitiya.

Zêdan bi destê lawikê fille girtibû bi kêf ber bi malê ve diçû.

tepîna dil sîngê dihejand, kelecana wî li ser girên Qerejdaxê bi dîlanê ketibû. Her di çû gavan li xwe dişidand û dixwest demeke berê mizgîniyê bide dotmama xwe. Bi rê de bixwe bixwe dipeyvî:

Ev bîst sale li benda kurekî bûm vaye Xwedê da min, dotmam ji kêfan re nexeriqe başe.

Zêdan ji dotmama xwe hez kiribû û ji bîst salî zêdetire ku pêre zewicî bû. heft keçên wî hebûn lê nebûbû bavê kurekî. Ji bo ji nû ve bizewece, malbatê pirr zor dabûnê, lê wî qêmîşî dotmama xwe nekiribû. Bi xeyala kurekî dijiya û aniha bi destê wî girtibû ber bi malê ve diçû.

Meleyê gund jî wek gundiyên din carina li dora qefleyê bi zexelî diçû û dihat carina jî xwe li bin siya darekî dida erdê û bi awirên xwe yên tûj wan dida ber xenceran. Ew wêrekiyê di xwe de nedidît ku bi çepelê çend heba bigire hinekî ji qefleyê bi dûr bixe û miradê dilê xwe bi cî bîne, Mele dîtibû ku Zêdan bi destê lawikê fille girtiye û ji qefleyê dûr dikeve. Wek nêçîrvanekî ku bide dû nêçîra xwe, xwe ji gundiya dizî û bi awayekî bêdeng bi dû Zêdan û lawik ket.

Zêdan nêzikî li mal kiribû, ji kêfa lawik re nîv serxweşî bûbû, dinya xerabibûna pê nedihesiya. Ew ketibû xeyal û tatêla dema dotmama wî çav li lawik bikeve û jê re bibêje ev kî ye? Mele jî nêzikî li wan kiribû, çav li serî sor bûbûn, ji vê dinyê çûbû dinyakeke din. Hiş ji serî çûbû, wek yekê din ketibe nav mejiyê wî û ew jî bibe emirber bêhemdî tevdigeriya. Êdî çend gav li dû wan bû, nêçîr di nav destê wî de bû. Xwar bû, ji erdê kevirekî mezin xist nav lepê xwe û ji paş de li nav serê lawikê fille xist. Lawik di nav xwînê de gevizî, beqa nekir, di cî de can da.

Heta Zêdan li xwe hay bû, lawik ji dest çûbû. Di cîyê xwe de sar bû, wek beroşeke ava cemidî biseridekin di nav xwêdanê de mabû. Ne li benda tiştek usa bû, matmayî li mela mêze dikir.

Piştî ku hişê wî hat serê wî bi çavên kelogrî bi ser mele de qêriya:

Lawo, ma lawik niyabû diya te, te wî kuşt?

Mele li hember wî sekinî bû, ji kêfa devê wî bihustekê vebûbû, diranên zer di nav herdu lêvan de nîq dikirin. Bi dilekî rehet bersîva Zêdan da:

Xêra ku wê bigîhişta te bila bigîhije min, ma te yê jî ew nekuşta?

Teqet di canê Zêdan de nemabû, serê xwe xist nava herdu destên xwe û li ber termê lawikê fille çok da erdê.